
# ISOT

KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ / HUMORISTISK KURDISK TIDNING

KOVARA WE JI DU MEHA CAREK DERTÊ




KOVARA WE JI DU MEHA CAREK DERTÊ




KOVARA WE JI DU MEHAN CAREK DERTÊ




## ISOT KET SALA 2'AN


KOVARA WE JI DU MEHAN CAREK DERTÊ




4
1986




HEJMAR 5 1986




KOVARA WE JI DU MEHAN CAREKÊ DERTÊ
VARANNAN MÅNAD KOMMER UT

hejmar : 6

ÇILEYA PÊŞÎN 1986

KOVARA WE JI DU MEHAN CAREKÊ DERTÊ

VARANNAN MÅNAD KOMMER UT

# hejmar : 7

ÇILEYA PÊŞÎN 1986

KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ
HUMORISTISK KURDISK TIDNING
JOURNAL HUMORISTIQUE KURDE

ANSVARIG UTGIVARE
OCH REDAKTÖR:

MAMOSTE

XWEDÎ BERPIRSIYAR
Û REDAKTOR:

MAMOSTE

NAVNÎŞAN / ADRESS:
c/o Gezgın
Axbyplan 5
163 73 SPÅNGA/SWEDEN

BUHAYÊ WÊ / PRIS:
10 Skr. 10 Ff, 3 DM.

ABONA SALEKÎ : 70 Skr.
PRENUMERATION: 70 Skr.

TFN: 08/760 81 23
POSTGIRO: 496 03 75-6
ISSN: 0283-099X

# RÎCAYEK

Rîcayeka me (wek Kovara ÎSOT) ji we partî û grubên Kurdan heye. Ku hûn bînin cî emê pir bextiyar û dilşad bibin.

Rîca me ji we ev e:

Em ketine bextê we, tu civîn konferans an kongera çênekin. Hûn bi hejmarên xwe ji me Kurdan re besin. Heta li gorî rewşa anuha pir in jî.

Li gor tecrubên me û hûn jî van tecruban hercar rast derdixin, ku her civîn, konferans an kongreka we tê wê ma'nê ku wê partiyek an grubek nûh çêbibe. Carna piştî civînên we sê-çar heb grub an partiyên nujen ava dibin.

-Bes e!

Ên wek me ku xwe piçekî pêşwerû dihesibînin, dev ji polîtîka û îdeolojiya we berde, êdî em nikarin navên we ji hevdû derxin an nas bikin. Edî kes nizane kî kiye!

Sedem jî, tev ev konferans û kongrên we ne.

Em dîsa rîca dikin ku hûn dest ji van konferans û kongrên xwe berdin.

Ji anuha ve spas.

ÎSOT

www.arsivakurdi.org

# HERAMÎ

Bi du saliya ÎSOT'ê, "BÎT"a Tirkiyê çil heb heramiyên xwe şandine Swêdê. Ew nuha di kuçên Stockholmê de teb-dîl-î qiyafet digerin da ku ÎSOTEKÊ bi dest xin.

Hûn nekevin dek û feqên van hera-miyan. Divê hûn ÎSOTEKÊ jî bi dest wan nexin.

Bêjin erêêê!

Hûnê bêjin çima?

Belêêê!..

Piştî Komîta Afê zor da "KUNTA" Tirkiyê, ew jî êdî nema karin pir bi eşkere li girtiyan xin. Weca hû-nê bêjin "Ev tişt û ÎSOT, çi têkili-ya wan bi hevre heye?"

Belêêê, belêêê... Heye!

De guhdarî kin!

"BÎT" ji îro pê ve, ku kê digre, ÎSOTÊ di pozên wan dide. Ger ew kes pozê xwe bikşîne, bipişke an jî ça-vên xwe biqermiçîne û skumê xwe tirş û tahl bike, bi şaşî lêvê xwe dale-qîne, wê wextê "BÎT" dide lotika û dibêje:

Temam e, temam e. Viya bibin fe-leqê, pozê wî şewitî! Me boliciyek girt.

Eger ew pozê xwe nekşîne, nepişke, çavên xwe neqermiçîne, skumê xwe jî tirş û tahl neke an lêvên xwe dane-leqîne wê gavê "BÎT" dibêje:

Wî berdin bira here tiştek di "tu-na" wî de tune. Binêr pozê wî ji ÎSOTÊ jî naşewite!

SÎNO ZIRNE




www.arsivakurd.org

# TEST
# TU KÎJANÎ?

## PÊŞMERGE YÎ YAN PAŞMERGE YÎ?



Nîşana "X" dayne hindurê çarçewê! Puanên te ji nîvê giştî puanan zêdetir be, wê demê tu "PÊŞMERGE" yî û kêmtir be wê demê tu "PAŞMERGE" yî. Kopîa kişandin delaletê paşmergeyî ye.

1 Tu li ku rûdinî?
- A)Li Kurdistan ☐
- B)Li Swêd ☐

2 Tu di tu rêxistinan de yî?
- A)Belê ☐
- B)Na ☐

3 Tu serokî?
- A)Belê ☐
- B)Na ☐

4 Tu dixwazî bibî serok?
- A)Belê ☐
- B)Na ☐

5 Çend lib Kurdistan heye?
- A)1 lib Kurdistan ☐
- B)2 lib Kurdistan ☐
- C)8 lib Kurdistan ☐
- D)12 lib kurdistan ☐

6 Kurdistana herî mezin kîjan e?
- A)Kurdistana Kurdan ☐
- B)Kurdistana Ermenîstan ☐
- C)Kurdistana Lubnan ☐
- D)Kurdistana Swêd ☐

7 Tu nivîskarî yan na?
- A)Belê ☐
- B)Na ☐

8 Tu çend rojname û kovaran çapdikî?
- A)1 kovar û rojname ☐
- B)2 heb ☐
- C)4 heb ☐
- D)6 heb ☐

9 Tu çi dinivîsî?
- A)Roman ☐
- B)Helbest ☐
- C)Çîrok ☐

10 Tu kîjan polîtîkayê baş dizanî?
- A)Netewî ☐
- B)Navnetewî ☐

11 Tu di bera digihînî, ku hemû pir tûk, kovar û rojnamên Kurdî bixwînî?
- A)Belê ☐
- B)Na ☐


12 Tu hejmarên hemû rêxistinên Kurdan dizanî?
- A)27 rêxistin ☐
- B)31 rêxistin ☐
- C)38 rêxistin ☐
- D)41 rêxistin ☐

13 Tu tevî meş û civînan dibî?
- A)Belê ☐
- B)Na ☐

14Tu çewa polîtîka xwe dimeşînî?
- A)Di rêxistinekê de ☐
- B)Di mala xwe de ☐

15 Neha mode çi ye?
- A)Roman nivîsîne ☐
- B)Rexne girtine ☐
- C)Rojname derxistine ☐
- D)Vîdeo nêrîne ☐

16 Kîjan roman dikare xelata Nobel'ê bistîne?
- A)Romana EZ ☐
- B)Romana EZ û EZ ☐
- C)Romana EZ, EZ û EZ ☐





| | | |
|---|---|---|
| 1-) | A:5 puan | B:1 puan |
| 2-) | A:2 puan | B:5 puan |
| 3-) | A:6 puan | B:0 puan |
| 4-) | A:5 puan | B:1 puan |
| 5-) | A:0 puan | B:5 puan |
| | C:7 puan | D:9 puan |
| 6-) | A:0 puan | B:4 puan |
| | C:5 puan | D:9 puan |
| 7-) | A:1 puan | B:5 puan |
| 8-) | A:0 puan | B:3 puan |
| | C:0 puan | D:0 puan |
| 9-) | A:2 puan | B:0 puan |
| | C:5 puan | |
| 10-) | A:1 puan | B:9 puan |
| 11-) | A:0 puan | B:8 puan |
| 12-) | A:3 puan | B:5 puan |
| | C:7 puan | D:9 puan |
| 13-) | A:0 puan | B:9 puan |
| 14-) | A:1 puan | B:9 puan |
| 15-) | A:8 puan | B:4 puan |
| | C:3 puan | D:9 puan |
| 16-) | A:1 puan | B:5 puan |
| | C:9 puan | |

DIQET! Ev Azmûna, ji hêla Zanîngaha Kurdistana Swêdê, Aqilmendiya Kurdistana Frensa, Enstîtutîta Elmanya, Zanîngeha 'BOYS'ên Kurda li Ingîlîstanê û zanîngehên beşên Kurda ve hatiye amade kirin.
TACK MERSI DENKIŞUN TEHENEKYU

**KOLIKÎ**

www.arsivakurdi.org

Xwendevanên Hêja, şaş mebin: ev ne xerîta trênê ye. Ev şema rêxistinek siyasî ye. Bi babetekî din, ev secera me Kurda ye. Em Kurd, çawa partî an gruban ava dikin, digîjin hev û ji hev belawela dibin.





# "PIÇIKEK JI PIÇAN"

"Min û wî merovî di tirênekê de me hevdît. Tirêna me li ser şiva hesen, a çûnê û hatinê diçû (Şiva hesên a çûn û hatinê,mana xwe şivek tenê ye û ...)".
  Heseno lawo, wê qey çend şivê te hebûna?
  Ma nivîskarê me nizane , her merivek şivek tenê pêve heye!.. "(Şiva hesen a çûn û hatinê,..)" an jî , her neyse ji xwe wê yek tenê be. Herkes bi vê yekê dizane, bira nivîskarê me serê xwe pê neêşîne. Ya ku em pê nizanin, çawa trêna nivîskarê me li ser şiva hesen diçû û dihat....




QEY TU NIZANÎ, MERIV ÎŞEV NAXEBITE? EZ DIBÊJIM, EV TIŞT HEMBERÊ KARKERÊN DI GREVÊ DA NE!...




# ÎSTÎQBAL

Li bajêr meşek gelek mezin hebû. Lasse jî bi pîreka xwe û zarokên xwe tevî vê meşê bû bûn. Piştî ku axaftin diqedin û meş belav dibe Lasse û zarokên xwe vedigerin mal. Bi rê ve Andersê biçûk ji bavê xwe dipirse, dibêje:

''Bavo! Ma hogir çiye?''

Bav:

''Ez û tu hogirên hev in. Yanî tu hogirê min î.''

Anders: ''Ê başe, lê îstîqbal çiye?''

Bav:

''Îstîqbal va birayê te yî biçûk yê di erebê de ye.''

Anders, îcar dibêje:

''Ê lê gel çiye?''

Bav:


''Diya te, van însanên li dora me hemû gel in.''

Diherin malê, hemû radikevin. Bi şev nîvê şevê Andersê biçûk radibe dihere bi ser nivînê bavê xwe re disekine û bi dengekî hêlî ban dike, dibêje:

''Ya hogir, zû ban gel ke îstîqbal bi xwe de kiriye ji bîna mirov nikare di hundur de bimîne.''













## ZAROK

ZAROKÊN ME
EVÎNA ME
GULA BER DILÊ ME
BUHARA WELATÊ ME
ME....

















## Seydayê Keleş
## EM Û DIJMIN



EMÊ ŞER BIKIN

...

Bi tang û bi top û bi balafira
Dûman û dixanê emê çê bikin

Emê yek nehêlin, ji dijmin tevî
Tofanek mezin her emê lê bikin

Ji salên berêve bi kînim li wan
Çi tiştê ji me bê, emê tê bikin

Berlîn hilweşînin heta Londera
Wekî leşkerê sor, emê lê bikin

Waşinton û Bonê bikin ceheneme
Wî navê revoka, emê lê bikin
...

SEYDAYÊ KELEŞ

Bi çap kirina vê pirtûkê, her çiqas em spas dikin ji WEŞANÊN ROJA NÛ re ku me agahdar kiriye li ser planên Seydayê Keleş, Lê dîsa jî ji tirsan xew nakeve çavên me.

Seydayê minî Keleş, em zanin tu keleşî. Lê keleşiya xwe di serên me multeciyan de necerbîne.

Tu bi xwe jî zanî bi sed hezaran Kurd û yên wek Kurd bi navê multecîtiyê li Almanya dijîn. Ji bo vê yekê, berê tang û topên xwe nede Berlîn û Bonê. Û tucarî jî xwe nêzîkî Stockholmê neke. Ji ber ku serekwezîr, wezîr, partî û grubên meyî Kurdan û WEŞANÊN ROJA NÛ bi xwe jî li vir dijîn. Welleh, bîlleh em derewa nakin. Eger tu ji me bawer nakî li ser pirtûka xwe a nû çap kirî binêre.

Lê ji bo cîhên din em ji te tu rîcayî nakin. Her çiqas li London hinek kakacan hebin jî, lê tu û vîcdanê xwe. Tu bi tang û topên xwe an bi fasulye û nokên xwe wan deran wîran dikî, an jî dixî cehenem tu zanî.


Xwedê wan ji xezeba te biparêze. Amîn...

Zarukno razên Seydayê Keleş hat!

ÎSOT


www.arsivakurdi.org


Di vê hejmara ÎSOT'ê de jî, emê karîkaturîstekî li Kurdistana Turkiyê hatiye dinyê pêşkêşî we xwendevana bikin.




## Cem Kenan ÖNGÜ

Cem Kenan Öngü di 1951' de li Meletyê hat dinyê Muhasebe xelas kiriye. Bi navê "Kemikzadeler" pirtûkeka karîkatura çap kir. Nuha di kovara "İktisadi Araştırma"yê de dixebite.





AGAHDARÎ

NUMIRÊN "POST-GIRO" YA ÎSOTÊ DI HEJMARÊN BERÊ DE ÇEWT HATIYE ÇAP KIRIN.
RASTIYA WÊ WUHA YE

POSTGIRO: 496 03 75-6

ÎSOT

www.arsivakurdi.org

# ÇALIM ŞEWQÎ





## AGAHDARÎ



KU HÛN DIXWAZIN JI KOVARÊN KURDÎ RE ABONE BIBIN, JI ZAHMETA XWE RE NAVNÎŞANA XWE LI VÎ CIYÊ KU ME NÎŞAN DAYE BINIVÎSÎNIN.

SPAS

www.arsivakurdi.org




www.arsivakurd.org

VÊ RÛPELÊ DI VIR DE JÊKIN Û JI NAVNÎŞANA JÊRÎN RE BIŞÎNIN.

NAVNÎŞAN: Milli Savunma Bakanlığı
Personel İşler Müdürlüğü
ANKARA / TURKIET

## PERÊN HÛR

Heciyê Bazargawur tu carî ji tu kesî re pere hûr nedikir. Ku dexîla wî tije perên hûr bûna jî wexta yekî digot: "Xalê Hecî tu karî bi xêra xwe vî sed an bîst baknotî ji min re hûr bikî?", bersiva Heciyê me hazir bû.

—Na, na bi Xwedê û sê telaqê bê fitwe tune ye.

Cîranên Heciyê Bazargawur êdî bi bersîva Hecî zanibûn û ji ber ku Hecî hinekî giran dibihîst, cîranên wî lê fen dikirin. Pêncî an sed baknotî dixistin destên xwe û diçûn ber deriyê dikanê û digotin:


—Xalê Hecî, Xalê Hecî qet îmana te heye?

Ji Hecî wêtirê, jê perên hûr dixwazin û bi carkê ve bersîva wan dida:

—Na, na bi Xwedê û sê telaqê bê fitwe tuneye...



## HILBIJARTIN




www.arsivakurdi.org

# QEHREMANÊ BÊ NAV








ISOT

KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ
HUMORISTISK KURDISK TIDNING
JOURNAL HUMORISTIQUE KURDE

ANSVARIG UTGIVARE
OCH REDAKTÖR : MAMOSTE
ADRESS : c/o Gezgin, Axbyplan 5, 163 73 SPÅNGA
TFN: 08/760 81 23 POSTGIRO: 496 03 75-6
BUHAYÊ WÊ / PRIS : 10 Skr, 10 Ff, 3 DM. PRENUMERATION 70 Skr
ISSN: 0283-099X